



Gelo Îranê bi rastî kariye bomba pêşkevî çê bike?

»»» R:5



Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (345)06-03-2019 Buha (1000) Tûmen



سه‌های آزادی

به کربزی و هاو کاریمان، رهمزی سر که وتنمانه



ئاوێندی هاوکارین چینه‌کانی کوردستانی ئێران
 Cooperation Center Of Iranian Kurdistan's Political Parties

Peyama Navenda Hevkarî ya Hizbên Kurdistana

Îranê derheq nûbûna salê û newroza Kurdewarî

»»» R:3

Gireva mamostayan nîşanek ji xebata bajar e



Piştî gireva seranserî ya mamosteyan li Kurdistan û Îranê, Îdareya Perwerde û Hînkirinê, ya li bajarê Seqizê, gefên pêkanîna dosiyeyan ji mamostayên wî bajarî xwarine.

Li gorî rapora ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, îdareya perwerde û hînkirinê ya li bajarê Seqizê, piştî gireva seranserî ya mamostayan, gef li mamostayan xwarine, û ew xistine bin givaşan.

Li gorî çavkaniyeke agehdar, îdareya Perwerde û Hînkirinê ya bajarê Seqizê, bo bidawîanîna gireva mamostayên xwendingehên wî bajarî, hawara xwe bo rêyên neyasayî birine.

Herwisa vê çavkaniyê daye zanîn ku, tevî gefxwarinên Îdareya Perwerde û Hînkirinê ya bajarê Seqizê, ew gireva seranserî ya mamosteyan, di zêdeyî 70 xwendingehên wî bajarî de hatiye lidarxistin.

Wezareta Karê Derve a Amerîkayê jî li ser rûpela “Twitter”a xwe, piştevanîkirina xwe ji gireva mamostayên Îranê ragehand. Wezareta Karê Derve a Amerîkayê, li ser rûpela “Twitter” a xwe ya bi zimanê Farsî wiha nivîsîbû: Cîhan dengê mamostayên Îranê dibihîse, lê berpîrsên rejîma Îranê, heya niha jî piştevanîkirina girûpên terorîstî yên wekî, Beşar Esed, Hizbullah a Lubnan, Hemas a Felestîn û Husiyên Yemenê baştir dizane li çav rewşa xirab ya hevvelatîyên xwe. Herwisa her sal bi milyonan Dolarî xercê wan girûpan dike, di demekê de ku dikarin wê xercê bo aramiya xelkên xwe bi kar bîne.

Roja Yekşemî 12`ê Reşemeha 1397`an (2`ê Adar)`ê, piştî belavbûna daxuyaniya Şêvra Hevahengî a Navendên Sinfî yên mamostayan bo gireva seranserî ya mamostayên Îran û Kurdistanê, li bajarên cuda, bi awayekî berfirehtir ji demên berê, dest avêtine girevê, û ew gireva heya 3 rojan berdewam kir, û daxwaza bidestveanîna daxwazên xwe kirin.

Sergotar

Derbeya
Pasdaran

Kerîm Perwîzî

Peyva derbeyê destewajeyê Firansî ye ku tê wateya bidestvegirtina deshilatê ji riya bikaranîna hêzê ve. Ev peyv di edebiyata siyasî de zêdetir bo wan deshilatên bikaranîn ku hêza nizamî ya welatekê ji riya belavkirina hêzê û çavtirsandîkirina siyasîyan û kontrolkirina radyo û televzyonê ve deshilatê digirne dest û deshilateke leşkerî radigehînin.

Mînaka van cure deshilat bidestvegirtinan hem di cîhanê û bi taybetî cîhana rojhelatî de zor e, û hem di Rojhelata Navîn gellek caran dubare bûye û di Îranê de jî derbazbûyîyeke pirr ji deshilatê leşkerî heye. Ji derbeya Rezaxan ve bigre heya derbeya Gelawêja 1332-an û derbeya Xomeynî ji riya fetwaya cîhadê li dijî Kurd û piştre derxistina Benîsêdr û şerê ser-taserî digel Mucahidînê Xelq, welatê Îranê teji bûye ji xwîn-rêjî û derbeyê. Ya ku cihê basê ye baskirin e ji gotegota derbeya Spaha Pasdaran di vê qonaxê de. Herçend gellek caran di heyama zêdetir ji 20 salên borî de bas ji derbeya Spaha Pasdaran hatiye kirin û yekem car di dehka 70-î de, wê demê ku beşek ji rejîmê li jêr navê reformxwaziyê de xelk dixapand, gellek bas ji derbeya Spaha Pasdaran dihate kirin û heya nameya

Derheq berfirehkirina hewzeya endambûna Navenda Hevkariyê a Partiyên
Kurdistana Îranê hate axavtin

Dazdemîn civîna Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistana Îranê hate lidarxistin, û li ser komek bas û mijarên girêdayî bi kar û erkên Navenda Hevkariyê axavtin, û guhertinên bîr û ramanan kirin.

Roja Sêşemî 14'ê Reşemehş (4'ê Adar)'ê, Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê civiyan, û derheq komek bas û mijarên girêdayî bi kar û erkên Navenda Hevkariyê axavtin, û guhertinên bîr û ramanan kirin.

Di destpêka karê civînê de, Omer Balekî, endamê Deftera Siyasî ya HDK'ê, ku di vê heyamê de berpirsayetiya dewra Navenda Hevkariyê li stûyê wî bûye, destûra karê civînê xiste ber bas, û di beşeke din de jî, "Sorana Nûrî" raportek derheq kar û çalakiyên Navenda Hevkariyê, yên di vê dewrê de pêşkêş kir.

Herwisa di beşeke din a vê civînê de, li gorî destûra karên spartî yên civîna 11 a Navendê hate nîqaşkirin, û li ser çavaniya kar û erkên Navenda Hevkariyê ya girêdayî guherînkariyên niha û yên pêşerojê yên li Îranê axavtin hate kirin, û biryar hate dan da ku, hewlên zêdetir bo tundkirina alîkariyan bê dan.

Mijareke din behs li ser hate kirin, zêdekirina kar û çalakiyên Navendê, û herwisa berfirehkirina hewza endambûna, Navenda Hevkariyê bû ku, biryarên hewce li ser hatine dan.

Beşeke din a karê vê civîna Navendê destnîşankiribû bo, raporta xebata komîteya zînamê dayîkê û nîqaşkirina li ser çalakiyên 2'ê Reşemhê yên îsal ku, ji aliyê Navenda Hevkariyê ve, destxweş ji birêveberên Komîteya Roja Zîmanê Dayîkê hate kirin.

Beşa dawî ya civînê bo bihîstina raporta komîteya amadekarî ya Newroza îsal hatibû veçetandin. Ewên ku di civînê de beşdar bibûn, nêrînen xwe anîn zîman û rêka rêveberiya komîteya amadekariyê zêdetir ronî kirin.

fermandeyên Spahê jî bo Xatemî hate belavkirin.

Di wê dewreyê de jî û di dema gotûbêja digel welatên Rojavayî û ketina nav dorpêça zêdetir ya rejîmê de basa derbeya Spaha Pasdaran cardin tê kirin! Ya ku di warê derbeya wehmî û xeyalî ya Spaha Pasdaran de dibe jê hûr bin, eva ye ku,

Yekem: Her demê rejîm hewla çewtekariyan dide, bo xwînşirînkirina aliyekî di nava raya xelkê de, gotine ku Spaha Pasdaran li dijî wê ye, yan bas ji dijberiya Spaha Pasdaran bo Xatemî yan Rohanî hatiye kirin!

Yan hatiye gotin ku ew Spah ji karên Xatemî û Rûhanî nerehet in û egera derbeyê heye. Bîst sal in jî, her dibêjin egera derbeyê heye, lê Spaha Pasdaran li dijî Xatemî û Rûhanî hêz nelivlivand û tank ne-anîne ser kolanan, lê hemû hêzeke xwe û Rûsiye û Çîn jî li dijî lawên nerazî xistin ger, û ne Kurdistan, û Ehwez û Belûçistan, belku şeqamên Tehranê jî, bi tank û zirêpoşan dagîr kirin ji tirsê xelkê!

Kolan û şeqam nîşan didin ku Spaha Pasdaran ji çî nerehet e, ne çewtekariyên reformxwazên rejîmê! Duyem, Spaha Pasdaran bi bê livlivandina hêzê, hemû navendên deshilatê di Îranê de bi dest ve girtine, û hewsarê wê jî di destên Welîyê Feqîh de ye! Welîyê Feqîh ku xwediyê hemû deshilatekê, û Spaha Pasdaran a amade di hemû kuncikekê de, heta di qaçaxa ser sînor û bazara neftê û avahiyan û îmamzadayan! Derbeyê li dijî kê bikin.

Eva di demê de ye ku hertim kesek ji wan hewce ye ku di navxwe de bêjin, ku eva rewşa xirab ya aborî ye, û tawana wê jî vedigere ser serkomarê dîkor û li derve jî bi girnîjî û pêkenî ve raya cîhanê bilêbîne! Deshilatek reha ji detsê Welîyê Feqîh û hemû serwet û saman û dahata welat jî di bin kontrola Spahê de be, û rûçikeke dîkor jî bo şikandina hemû kêmasiyan bi ser de, û rûçikek derveyî jî maskeke lêvken be, û pakaneyê ji bo cinayetên rejîmê bîne, di vê sîstemê de gelo kî li dijî xwe kudetayê dike!? Wehm û tirsê derbeya Spaha Pasdaran tenê gotegoteke bona çewtekariyan û tirsandina xelkê û rewatiyeke derevîn e bo dîkora serkomariyê û wezîran.

Peyama Navenda Hevkarî ya Hizbên Kurdistanê Îranê derheq nûbûna salê û newroza Kurdewarî

Navenda Hevkarî ya Hizbên Kurdistanê Îranê derheq nûbûna salê û newroza kurdewarî pey-amek bilav kir.

Deqa peyamê:

Hevwelatiyên hêja!

Xelkê azadîxwaz ê Kurdistanê!

Destpêkê û li bereberê hatina sala nû ya kurdewarî de, bi navê Navenda Hevkarî ya Hizbên Kurdistanê Îranê, pîrr bi dil em pîrozbahîya nûbûna salê û newroza 2719'an a Kurdî li we dikin.

We xelkê mafxwaz ê Kurdistanê hemû salekê serbarê zext û çavdêriya çirr ya hêzên ewlekariyê ên rejîma Îranê, kariye ku nûbûna salê û merasimên newrozî bikin derfetek ji bo nîşandana kêfxweşîya xwe û bangewa xwestek û daxwaziye neteweyî û mirovî ên xwe wek neteweyekê, ku heya niha ji mafên herî destpêkî û azadiyan hatiye bêparkirin.

Di çend salên borî de, merasimên newrozî li Kurdistanê bi awayên cuda ji demên din, bi peyam û diruşm û hêma û simbolên taybetî bi rê ve çûn, ku nîşana bilindiya asta şî'ûrê û hişyariya neteweyî û rêxiraweyîbûna îradeya giştî ya civaka Kurdistanê ye, lewra îsal jî hewce ye ku merasimên newrozê di asteke berfirehtir de, bi nav û diruşmên taybet ve, bi awayekî yekgirtî bi rê ve herin, û bikin derfetek bo gehandina komeke wate û peyamên neteweyî û nasnamexwazane. Lewra Navenda Hevkarî ya Hizbên Kurdistanê Îranê her wekî ku ji aliyê civatên xelkê Kurdistanê ve çavnehêrî lê dihate kirin, di vê derheqê de bi awayekî yekgirtî û ji kanala giringîdana bi hewcehiya yekrêzî û pêkvebûnê di hemû astan de daxwaz ji xelkê Kurdistanê bi hemû tex û qatên xwe ve dike ku:



1-Merasimên newrozî ên evsal, li jêr navê “Newroza semaya azadiyê” de, bi rê ve herin.

2-Bila diruşma serekî ya merasimên newroza evsal a me, “Yekrêzî û hevkarîya me, remza serkevtina me ye” be.

3- Di merasiman de hewce ye ku em “Cemedanî, Hewrî û gulên sor” bi kar bînin.

Xelkê xwedîhelwest ê Kurdistanê aliyê kêma di heyama tenê çend mehên borî de zêdetir ji her demekê nîşan dane ku bi awayekî yekgirtî pêşwaziye dikin ji bangewaz û daxwaza hêz û aliyên siyasî ên xwe, û çavnehêriya wan jî -di qonaxa niha ya xebata li dijî siyasîyên dijîgelî ên rejîma Komara Îslamî ya Îranê de- yekgirtin û pêkvebûn e. Xelkê Kurdistanê li hemberî kiryarên dijîgelî û terorîstî ên rejîma Îranê, mûşekbarana binke û baregehên hizbên Rojhilata Kuredestanê, û bidarvekirina sê bendkiri-yên siyasî ên Kurd, Zanyar û Luqman Muradî û Ramîn Husênpenhaî, di roja 21`ê Xermananê de û herweha bi boneya roja cîhanî ya zimanê dayîkê di 2`ê Reşemeha evsal de, nîşan dan, ku bi awayekî yekgirtî ewê li dijî siyasîyên dijîminkarane ên rejîmê bixebitin, û xwedî li xebata nasnamexwaziya xwe derkevin.

Lewra tê çaverêkirin ku bi boneya nûbûna salê û newroza evsal ve jî, hûn bi rêxistina merasimên giştî û girseyî bi awayekî yekgirtî, xwedî li maf û azadiyên kulturî û



neteweyî ên xwe derkevin.

Di vê derheqê de, erk û wezîfeya li ser milên gotarbêjan, helbestvanan û hunermendan e ku naweroka qise û mijar û hunera wan, teji be ji peyama yekgirtina neteweyî, û xebata li dijî zulm û zoriyê û siyasîyên dijîgelî ên rejîma Komara Îslamî. Bila di merasimên newrozî ên evsal de, bi alandina “cemedanî û hewriyê” li dewra stûyê xwe, û bidestvegirtina “gulên sor” û bilindkirina diruşma “yekrêzî û hevkarî remza serkevtina me ye”, “semaya azadiyê” bikin û biselîmînin ku li ser

bidestveanîna maf û azadiyên xwe wek neteweyekê em berdewam û pêdagir in.

Newroz li we hemîyan pîroz be

Bi hêviya saleke pîrr ji deskevt û serkevtin bo tevegira mafxwazane ya xelkê Kurdistanê

Navenda Hevkarî ya Hizbên Kurdistanê Îranê
14.12.1397

Zîdana Diyarbekirê û sê endamên «PKI» ê



Bûbê Eser



Hêj 12`ê Îlona sala 1980`î bi ser me girtiyên wê zîndanê de nehatibê. Lê dengê potînên (sol) leşkeran dihat ku wê tiştêk biqewime. Em çî yên di zîndanê de çî yên li derve jî me texmîn dikir ku wê tofanenk rabe û ew tofana em li bendê bûn di roja 12`ê Îlona sala 1980`î de hat.

Lê ji ber cih di zîndanê de nemabû, wan zîndaneke li gor xwe modern(!) çê kiribûn ku me girtiyan tevan bixin wir. Wan bi derewan propagandeyek weha xweş û delal dikirin ku me hema li gor wê derewa wan dixwest em rojekê berî rojekê herin wir.

Dirêj nekim. Berî 12 îlonê dema girtiyek bihata girtîgehê me ango nevalên wî ew digirtin ba xwe ango qawîşa xwe. Ji ber wê demê di nava KUK û PKK şerekî bê aman li derve hebû. PKK gihiştibû wê bawriyê loma digotin:

-Heger em “KUK”ê ji holê rakin êdî deshilata bakurê Kurdistanê dikeve destê me.

Lê wan di şerde wan kirin û piştî wendakirina wan jî hema 12 îlonê hat. Ev noktayeke balkêş e ku hê jî partî û siyasetmedarên me li ser vê zêde nesekînin. Ji bona nas û dostên me, heval û hogirên me nekevin qawîşa pkkê me hema ew dianîn ba xwe. Kî biketa nava destên wan, li wê zîndanê wan ji polîsan bêtir êşkence bi wan dikirin.

Ji ber vê bû dema sê hevalbendên “PKI” (Partiya Komunista Irakê) tene girtin hevalên me yên derve em yên di zanêdebûn agahdar kirin ku dema ew hatin, wan bigirin ba xwe.

Em demekê li benda wan man û ew dem hat. Dema ew anîn zîndanê me got: ”nasên wan di qawîşa mede hene, bila bên vir” Wer hasil me ew anîn ba xwe. Lê wan ji erebî û inglîzî pêve tu zimanê din jî nizanibûn.

Me demek baş bihev derbas kir. Me hemî kêmaniyê wan tamam kir. Me ew jî weke hevalên me bin hesiband. Li gor wê jî perên ji me re dihat, xwarina me dikirî, ew jî dikirin hevparê wê.

Ya xerab jî ew bû û çî qewimî piştî 12`ê Îlona sala 1980`î. Ew agirê Kurdistan dişewitand, em jî di wê zîndanê de dişewitand. Piştî 12`ê Îlona sala 1980`î herkes mecbûr bûn ku tirkî fêr bibin û zimanên din hemî qedexê kirin.

Her roj bi me girtiyên wê zîndanê sirûdên leşkerî yê tirkên faşîst didan ezberkirinê. Di şevêkê de dive me du, sisê carna zêdetir jî ezber dikir. Emir weha bû. Piştî jimartina êvaran Qardiyanan carna du sê sirûd didan me û digot:

-Heta sibê divê herkes fêr bibin ango ji ber bikin.

Piştî hatina wê derbeyê hersê erebên me yên endamên PKI jî weke me tirkî bi darê zorê fêr bûn. Wan jî weke me heta carna ji me jî zêdetir û zûtir ew sirûdana ji ber dikirin.

Wan jî weke me her yekî ji wan nêzîkî 40 sirûdên leşkerî ji ber kiribûn.

Car carna em çend kes li gel wan bi awayekî dizî ku Gardiyan me nebînin rûdiniştin û sohbet dikir. Rojekê dîsa em bi dizîka çend kes li gel wan runiştin hinekî sohbet kir da ku halê wan zêde xerab nebe. Ji wan û bi qasî em fêr bû bûn ku ew berpirseki leşkerî ê “PKI” bû. Navê wî Abid Mihemed bû.

Li me kesên em li dor wî civiyabûn nêrî, û keserek kişand û weha got:

-Hûn bawer bikin dema ez ji vê zîndanê derkevim û leşkerek tirk bi dest bixim ango bigirim, ez ê quranê bidimê bû bêjim; heta sibê divê tu vê ji ber bike. Ya na tê bê kuştinê.

Belê; ev gotina wî ji dil bû. Ji ber di wê zîndanê de ferqa kesên girtî ji hev tune bû. Hemî li ber çavên dagirkeran, desthilata girtîgehê û wan zebeniyên ango Qardiyanên ber qawîşan yek bû.

Sê ereb bûn, zimanî wan erebî bû, lê nikaribûn bi wî zimanê qise bikirana. Tirkî bi darê zorê fêr bûn. Ev ne bes bû wan jî weke me meş û xwendina sirûdên leşkerî tirk ji ber dikirin (ezber) û dixwendin.

De ka carekê bifikirin bê li vê cîhana em lê dijîn, li kîderê, li kîjan cihê kesek nikaribe bi zimanê xwe qise bikin. Li vê cîhanê ev cih tenê Tirkiye ye.

Gelo Îranê bi rastî kariye bomba pêşkevî çê bike?



Michael Peck

Bomba JDAM, yek ji bombên kevin e ku ji aliyê Amerîkayê ve dema xwe hatiye çêkirin û piştê modela nû ya vê bombê hat çêkirin. Moldela nû ya vê bombê dikare ji rêya dûr ve were kontrolkirin û bi GPS`ê jî girêdayî ye û îrorojê weke bombek pêşkevî û bihêz tê hesêbkirin. Gorî Ajansa Nûçevanî ya Tesnîmê, ku ser bi Spaha Pasdarên Komara Îslamiya Îranê ye, niha Îranê, hemen ev bomba çêkiriye.

Rejîma Îranê herwiha ji rêya nişandana dehan cetên şerker yê Su-22 ku çêkiryê Rûsiyê ne û dema xwe “Sedam Hussein”, serokê berê yê Îraqê, ji tirsaya operasyonê “Bahoza Deştê” ji aliyê Amerîkayê ve teslîmê Îranê kiribû, xwast hêza xwe ya leşkerî nişan bide. Îran destbiser giritina cetên Su-22 bi mafê xwe dizane. Cetên ku niha îdî gellek kevin in û tenê hatine reng kirin û weke nû tîn xûya kirin.

Lê çima mediyaên Îranê bi nişandana û manordan bi teyarên kevin yê 30 salî, hewil dide vê yekê weke destektek ji Îranê re xwe bide nişan dan, hêj cihê pirsiyarê ye?

Ajansa nûçeyan ya Tensîmê, herwiha bi nişandan hinek bombên nû ku bi jêtên şerker yê Su-22 di nîmayêşa esmanî ya Novembra 2018, ve hatibûn girê dan, hinek pirsiyarên din yê bê bersiv afirand.

Şilk û forma bomban, rast weke yê Amerîkî ne. pêşî û dumahiya bombê bi awayek hatiye çêkirin, ku gellek rengê bombên JDAM dide.

Bê şik serê bombê, bombên pêşkevî û hoşmend yê Îranê bi navê Raad-301 bûn, lê heta niha tu zaniyariyek li ser sistema vê bombê û kontrola leyzerî tune.

Heta niha, Îranê bi awayek resmî îlan nekîye ku ew bomb ji aliyê setelaytê vê jî tîn control kirin, û hemû ew tehlîlîn navxweyî û derekî li ser bingeha şik û gumanan e. Lê resmê bomba nû û bi taybetî cih û forma wê, vê egerê zêde dike ku ew bomb bi rêya setelaytê ve tîn control kirin.

Îran îlan dike ku kariye bomba pêşkevî ya bi navê JDAM, çê bike. Bombek ku di bingeh de Amerîkî ye û li şer dijî terorê tê bikaranîn



Îran herwiha dibêje ku wan kariye hinek teyarên bê sernîşîn û sistema radarî û sistema kontrola ji rêya setelaytê taybet bi xwe çê bike. Lê şarezayên Deftera Lêkolîna Leşkerî ya ser bi Amerîkayê dibêjin ku îdiaya Îranê derheq bidestanî û çêkirina modela nû û pêşkevî ya bomba JDAM direv e û gorî zaniyariyên me, ew bom temenê wan gellek kevin in û ne çêkiriye Îranê ne.

Îranê heta dema xwe îlan kir ku kariye Ceta şerker ya F-5 bi xwe çê bike, lê belê piştê derkevî ku ew cet çêkiriye Amerîkayê bûne ku di sala 1970 de bi Îranê hatibûne firotin.

Lêbelê nabe ew rastiye were ji bîr kirin ew metirsiya heya ku Îran dest bi wan silahên pêşkevî bikeve, ji ber ku Îranê ew şiyana heye û gihiştîye ew asta teknolojî û zaniyariyan di vê derheqê de. Îran heta şiyana heya ku silahên balêstîlk yê pêşkevî û renga bomba navokî çê bike.

Heta eger eva ku Îran niha dibêje direv be, lê ew rejîmê ew qabiliyeta heya ku di pêşerojê de bikarin bombên kontrolbûyî ji dûr ve û bi rêya GPS ve çê bikin.

W: Hemîd Muxtarî

Fîlmeke anîmasyonî ya derbarê Pêşmerge de tê amadekirin



Yekem fîlma anîmasyonî ya dirêj a bi navê ‘Têkçûna efsaneyê’ ku çîroka şerê Pêşmerge yê li dijî DAIŞ`ê vedibêje, di demê nêzîk de wê bikeve vîzyonê.

Ev fîlma ku senaryoya wî ji alî Piştîwan Ebdullah ve hatiye nivîsîn, ji alî hin kompaniyayên sînemayê ve jî hatine piştgirîkirin.

Senarîstê fîlma ‘Têkçûna Efsaneyê’, Piştîwan Ebdullah derbarê fîlmê de ragihand ku ev fîlma anîmasyonî ku mijara wê şerê Pêşmerge yê li dijî DAIŞ`ê ye, bi teknîka sînemayê ya nûjen hatiye

amadekirin.

Ebdullah got: “Fîlm çîroka lehengiya Pêşmerge ya li dijî DAIŞ vedibêje. DAIŞ, piştî Mûsilê dagir dike, berê êrişên xwe dide Hewlêrê. DAIŞ, dixwaze Kelheya Hewlêrê bi dest bixe û Ala Kurdistanê ji ser kelheyê bîne xwarê. Pêşmerge jî li dijî vê êrişa kambax, li ber xwe dide û DAIŞ a rêxistina terorî ya ku li Sûriyê û Îraqê dibe weke efsane, têk dibe.”

Piştîwan Ebdullah, da zanin ku ew bi fîlmeke pispore xebitîne, çend ji kompaniyayên girîng ên sînemayê piştgirî dane fîlmê û beşên destpêkê yê fîlmê bi serkeftî temam bûne.

Ebdullah destnîşan kir ku ev fîlm, yekemîn fîlma anîmasyonî ya dirêj e û piştî 9 mehan dê temam bibe û li Herêma Kurdistan û Îraqê bikeve vîzyonê.

Hilbijartinên bi bendewariyên mezin



Selaheddin Çelik

AKP

Dîsa hemû hêviya xwe bi Erdogan û derfetên dewletê ve girê daye. Lê em zanin ku ew ji zimanê êrîş û tevdanê hez dike. Dijmin pêwîst e; "HDP hevîkê PKKê ye". Bi wê gefê dixwaze derb li CHPê jî bide. Tevî piştgiriya çapemeniyê jî, serketina Erdogan bi helwesta partiyên dijber û fêma civakê ve girêdayî ye.

Desthilat bi gefa qayuman civakê ditirsîne. Û astengî, girtin, guhartina ciyên dengdanê, dengdêrên xeyalî..., wisa ku ew di çapemeniya biyanî de jî bûye mijara tinazan: "Serjimara Tirkîyê, ji ya Çînê borî".

Hilbijartina şaredariyan, rasterast bi berjewendiyên karsazên herêmî ve girêdayî ye. Desthilat gefa "hûn dûçarê min û kayimên min in" dixwe. Miroj ji kîjan alî ve lê binêre jî, nikare qala hilbijartina dadmend bike.

Di hilbijartinên salên dawî de desthilat, bi hunerî bi hişmendiya girseyan leyist. Kurd kirin hedef, li Kurdistana Başûr û Rojavayê operasyon kirin. Vê carê bingeha "serkeftinê derewîn" kême, lê li derve nebe, çima ne li hindirû?

Desthilata tirk her carê di nav rakeşîya şer de çû hilbijartinê. Pirsên navxweyî di tariyê de man. Her carê partiyên tirk dan pişt xwe. Vêga şerê Iraqê sekinî. Sûriyê jî, di wê rê de ye. DAIŞ şikest. Bi yeqînî wê razên veşartî eşkere bibin. Li Tirkîyê qeyrana aboriyî dayê pêşîya hemû pirs-girêkan. Ma desthilat û di şert û mercên aştiyê de hilbijartin, qet li hev tên?

Ji bo Erdogan û partiya wî, wateyêke din ya hilbijartinê heye. Partiya wî bi gilî û gazindan dikele. Ew di hilbijartinê de ne serkeftî be, nikare rê li ber bertekê bigre. Jixwe ji zû ve gotegota wê heye.

CHP

CHPê nasnameya sosyal-demokratî yekcar winda kiriye. Rewşa wê, wêneyê guhertin û tevliheviya demografîk, civakî, bîrdozî û siyasî ya Tirkîyê nîşan dide. Pîvanên kevneşop, gellek caran têra şîrovekirina wêneyê civakî û siyasal nake.

Ji bo dijberan girîngiyêke hilbijartinê, ji bêhêzkirina Parlemenê tê. Êdî ew haya çapemenî û civakê jî nakşîne. Piştî hilbijartinê, dibe mafê zagonderanîne jî ji destê Parlemenê derkeve. Dibe hilbijartinên şaredariyan, şensê dawî yê dijberan e.

Lê êdî xweseriya şaredariyan tineye. Proje, bi Qesrê ve girêdayî ne. Dibe bêtê destûra Qesrê, şaredar nikarin karmend û karkeran jî bigrin. Jixwe desthilat kengê bixwaze, dikare şaredaran ji kar dûr bixe.

Rêbaza demokratîk hêja ye, lê ku ew bibe leyistoka desthilatê? Hingê em dibin figûranê şanoya desthilatê. Yê jidil bixwaze bibe desthilat, yê jidil bawermendê demokrasiyê, dest û piyên xwe wisa girê nade.

HDP

Min dixwest qala taktîka kurdan bikim, lê helwesteke wisa hevpar tineye. Partiyên kurd bi hevbendiyên cuda dikevin hilbijartinê. Ne tiştêkî karesatî ye. Biryareke demokratîk e. Bila Kurd jî hîn rêzgirtina zagonên demokrasiyê bibin.

Parlemen û şaredarên HDPê, girtî ne. Bi sedan xebatkarên welat terikandine, qedexekirî ne û her roj tên girtin. Rewşeke dijwar. Lê rewş ev e û ew berhema pirsê kurd e û zû bi zû naguhere.

Li himberî partiyên kurd, eniya înkare, eniya nîjad û neteweperest heye. Ne tenê AKP, CHP jî li wir e. Yek jî naxwaze xwe nêzikî rastiya kurd bike. Ji wêkê jî têkilî û hevbendiyên eşkere direvin.

Li bajarên Tirkîyê berendam nîşannedana HDPê mirov fêma dike, lê valahiştina navendên weke Dîlok û Rihayê, dibe bibe sedemên encamên ne baş. Li navendên xwedî nav û deng weke Çewlîgê qelsbûn çêbe, wê ew birîneke kûr be.

Ez naxwazim bernameyên partiyên kurd şîrove bikim, ji ber ku ew bi helwesta desthilata tirk û bi hêz û huneriya şaredariyên kurd ve girêdayî ye. HDP, têkbirina qayuman daye ber xwe. Qayuman, mala zarokan, dibistan, bîrdarî, park, şano, sînema, navê partiyên, çi tiştê Kurdan bi bîr bîne, qedexekirine, rûxandine. Divê li himberî gotina me hebe.

Ev jî heye: Şaredarî, ji bo xizmetguzariyê ne. Ji parlementeran zêdetir şaredar nêzikî civakê ne. Başî û xirabiya wan, rastêrandor li civakê dike. Bi gotinan xizmetguzarî nabe. Tevî tengasî û astengiyan ê di xizmetê de civakê dilxweş bike, dikare qala serketinê bike. HDP winda bike, sedemek wê kêmasiyên berendamên wê be. Divê qam, gorî kar be.

HDP nikare ji rastiya kurd bireve. Jixwe hilbijartin li ser sîstema nîjadperestiya tirk dibe û ti partiya tirk yek gotinê nabêje. HDP, ne ji ber komara demokratîk û civaka ekolojîk û hwd, lê ji ber nasnameya kurd, ji ber berteka netewî, dangan distîne. Bi gotinê mirov nabe demokrat. Divê em neteweperestiya welatparêz biçûk nebînin, nexwe wê berdêl giran be.

Di zexmbûna HDPê de Selahattin Demirtaş sembolek e. Ji bo wî bêdengiya HDPê, mirov fêma nake. Dinya xwedî derdikeve, dezgehên navdewletî ji bonê piştgiriya xwe pêşkêş dikin, lê em? Ev bêxemi nîşana wê ye ku em hê bi fermanan dimeşin.

Li Rojhilata Navîn rewşa siyasî diguhere. Ev çend sal in, em bi DAIŞê radibûn û rûdiniştin. Vêga ew li paş dimîne. Serdema piştî DAIŞê dibe rojev. Kurd di navenda guhertinê de ne. Jixwe ji zû ve şikestinek heye. Hêviya yekîtiyê û serxwebûnê derb xwar û hin rêbazên kevneşop ên tekoşinê jî. Xweparastin, dîsa bi ser ketiye. Gava mirov hemûyan dide ber çav; girîngiya tevger, dezgeh û tekoşina demokratîk derdikeve pêş û herwiha girîngiya hilbijartinên şaredariyan. Ne tenê Kurd, Tirk jî bi pirs-girêkan xwe ve tenê mane. Ji wêkê mirov ji seranserê Tirkîyê di bendewariya encamên cuda de be, wê ew ne xelet be.



Nerîna Lîderan



Lavrov:

“Divê pirsra Kurd bê çareserkirin”.



Trump:

“Em dê beşek ji hêzên xwe li Sûriyê bihêlin”.



Xatemi:

“Xelk di hîlbijartinên bê de, piştevaniya me nakin”.



Larîcanî:

“Îraq dibe pêşî ji girûpên li dijî Îranê yê li wî welatî bigire”.

Amerîkayê derbarê kirîna S-400 de hişyarî da Tirkîyê

Wezareta Derve ya Amerîkayê ragihand ku eger Tirkîye ji Rûsyayê sîstema parastina hewayî ya S-400 bikire, dê dorpêçên aborî bixin ser Tirkîyê.

Cîgirê Berdevkê Wezareta Derve ya Amerîkayê, Robert Pallandino got: “Me bi aşkera hişyarî da Tirkîyê ku eger ji Rûsyayê sîstema S-400î bikire, em dê beşdariya wê ya bernameya firokeyên F-35an ji nû ve binirxînin û dê ev yek bibe sedem ku di siberojê de şandina çekên din jî bê rawestandî.”

Robert Pallandino destnîşan kir ku helwesta Amerîkayê ya li hember kirîna sîstema S-400î neguheriye û anî ziman ku ev helwesta Tirkîyê, ji bo Amerîkayê cihê metirsiyê ye.

Pallandino, diyar kir ku wan ji Tirkîyê re pêşniyaza kirîna sîstema Patriot û sîstemên din kiriye û got: “Me ji berpirsên Tirkîyê re aşkera got; di çarçoveya Yasaya Tekoşîna Astengkirina Aborî bi Dijminên Amerîkayê re (CAATSA) de, dewlet an jî kes û dezgehên taybet ên ku beşdarî pêvajoya kirîna sîstema S-400î dibin, bi astengkirinên Amerîkayê re rûbirû dimînin.”

Yasaya Tekoşîna Astengkirina Aborî bi Dijminên Amerîkayê re, ji aliyê Kongreya Amerîkayê ve bi mebesta astengkirin û sizadana kes, şirket, dezgeh û dewletên sêyemîn ên ku bi teşkîlatên sîxorî û parastinî yê Rûsyayê re kar dikin, hatiye danîn.

Pêştir Fermandarê Pilebilind ê Hêzên Hevpeyman ên NATOyê û yê Hêzên Amerîka yê li Ewropayê (EUCOM) Curtis M. Scaparrotti gotibu ku “Eger Tirkîye ji Rûsyayê sîstema parastina hewayî S-400î bikire, pêwîste dana firokeyên şer ên F-35an ji bo Tirkîyê bê rawestandî.”



Li Rojhilatê Kurdistanê greva mamosteyan berdewam e

Li Rojhilatê Kurdistanê greva mamosteyên dibistanên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê di roja xwe ya sêyem de berdewam bû, û biryar e dest bi dewama xwe bikin û dewama dibistanan asayî bibe.

Mamosteyên grevgirtî daxwaz ji desthilatê kir ku xwestekên wan werin cîbicîkirin û mamosteyên girtî werin azadkirin. Herwiha dawî bi givaşên siyasî yê li ser mamosteyan were anîn. Tevî vê yekê jî daxwaza zêdekirina mûçeyên mamostetiye û dabînkirina xwendina bêberamber û dadperwer di sîstema perwerdê de were kirin.

Li Rojhilatê Kurdistanê jî beşeke mamostayan daxwazê dikin ku hikûmet yasaya xwendina bi zimanê dayîkê li dibistan û zanîngehan peyrewê bike.

Di derbarê greva mamosteyan de Wezîrê Perwerde yê Îranê Mihemed Bethayî ragihand ku ew heya dawiya îsal pîrsgirêka li paşketina mûçeyên mamosteyên girêbest çareser bikin û herwiha hikûmetê pêşniyara damezîrandina 55 hezar kesan li Wezareta Perwerdê erê kiriye.

Amerîkayê girûpeke Heşda Şe`ibî xiste nav lîsteya terorê

Wezareta Xezîneyê ya Amerîkayê di daxuyaniyekê de ragihand ku Tevgera Nuceba ya Îraqî xistiye lîsteya terorê.

Tevgera Nuceba grûbeke çekdar a Îraqî ya ser bi Îranê ve ye û hebûna hêzên Amerîkayê li Iraqê red dîke.

Medyaya Amerîkayê ragihandiye ku herçiqasî roleke wê grûbê ya bi bandor di şerê dijî DAIŞê de hebû jî, lê hevdem rê jî li ber Îranê xweş kiriye ku bigihîje Şamê.

Tevgera Nuceba ya Iraqî sala 2013ê ji Esayîbî Ehli Heq cuda bû, û Ekrem Keîbî serkirdayetiya wê dîke.

Li gora hinek çavkaniyan, zêdeyî 10 hezar çekdarên Tevgera Nuceba ya Iraqî li Iraq û Sûriyê hene.

Di sala 2018an de, Wezareta Xezîneyê ya Amerîkayê çend siza bi ser Ekrem Keîbî de sepandin û ew weke yek ji sedemên nearamî û têkdana ewlehiya Iraqê da naskirin.

Ziman çepera berxwedana neteweyî



Cemal Fethî

Herçend ku di zanist û ziman-nasiyê de ziman wekî emrazekê bona pêwendîgirtin û avakirina hêleke têgihîştin û gehandina peyama û axavtinê tê pênasekirin, lê di rewşa siyasî û civakî a niha de, û di karûbarê navxweyî û derve ê welatan û deshilatdarên cîhanê de wekî emrazekê hêzê rola xwe dilîze.

Ew netewe û welatên ku xwediyê edebiyateke mêjîm in, û edebiyat jî berhema ziman e, hertim di nava rikeberiyên siyasî û civakî de, wekî çeka nerm di hemberî netewe û welatên din de bi kar tînin, bi watayêke din ew neteweyên ku xwedî wêjeyê bîhêz û dewlemend in, dibin xwedî heymene û deshilateke ferhengî a qahîm ku ew deshilata nerm dibe çeperek li hemberî êrîşa ferhengî ya neteweyên din de, jiber ku paş serhildana şoreşa pîşeyî û hatina rojevê ya têgehên siyasî û civakî ên modern ziman dewreke berçav dilîst di ber bi pêşveçûna şoreşên Rojava û bi taybetî neteweyên ku hewla cihgirkirina wekhevî û dadperweriya civakî yan pêvajoya sosyalîzmê dida, ku nivîsandin û çapa dehan pirtûkî di Yekîtiya Soviyet, Firansa, Alman û Amerîkaya Bakûr ji hêla nivîskaran û rewşenbîrên azadîxwaz mînakek in ku ji edebiyat û ziman wekî emrazekê di hemberî dîktatoran û wênakirina rewşa nebaş ya jiyana wekhevî a wê serdemê mifah wergirtine. Neteweya Kurd jî wekî hemû neteweyêke ser topa erdê xwedî ziman û wêjeya xwe ye, ku hertim ji hêla dagîrkerên Kurdistanê ve hewla helandina zimanê wê hatiye dayîn.

Eva ku neteweya serdest di kincê rejîmên cur bi cur de hewla helandina zimanê Kurdî dane û didin, sedema wê vedigere



bo şereke dîrokî di navbera du nasnameyan de, ku aliyêke wan hewl dide di piroseyê koloniyalîzmê de deshilateke jeopolîtîkî a xwe ku hemû biyavên dagîrkariyê bi xwe ve digre, bi ser aliyêke din (Kurd) de bisepîne, ku bi sedema bîhêzbûna biyavê ferhengî, edebî, û dîrokî ê aliyê belengaz û herweha berxwedana neteweyî a neteweya Kurd ew piroseya heya niha jî bi tewahî ser negirtiye, sedema serekî ya vê piroseyê jî vedigere ser vê ku neteweya Kurd cuda ji xebata siyasî û çekdarî di hemû qonaxekê de li pişt sengerê ziman û edebiyatê de kariye ku berevaniyê ji hebûn û nasnameya xwe bike. Xal û

perçeyên Kurdistanê de di nava xebat û berxwedana neteweyî de ye, û bi hemû şeweyekê hewl dide, da ku ji riya van pîvanan ve, neteweyîbûna xwe biselimîne, û wekî neteweyekê pênase bike û şunasa xwe ji kirîzê rizgar bike.

Ziman yek ji wan pîvanan e ku dagîrkerên Kurdistanê bi hemû pîlanekê heya niha jî nekarîne di helandina wê de, bi tewahî serkevtî bin.

Hekî dibêjin ku ziman nasname û stûna her neteweyekê ye, lewra tenê demekê takekes ji xwe bîhanî dibe ku zimanê dayîkê jê bê standin, ku ew yek qonaxa



pîvanên wekî: (Xak, dîrok, ziman, deb û resm, kinc, û hesta hevpar) pêkhînerê pêkhate û nasnameya neteweyî ne, ku di qonaxa niha de Kurd di hemû

bîhanîbûn ji nasname û kêbûna takên civakê ye, lewra digel serhildana xebata rizgarîxwaziya Kurd ji hêla aliyên siyasî ên neteweyî ve beşek ji xebat û

Ziman yek ji wan pîvanan e ku dagîrkerên Kurdistanê bi hemû pîlanekê heya niha jî nekarîne di helandina wê de, bi tewahî serkevtî bin

perwerdeyê bo fêrkarî û vegeşîna zimanê Kurdî hatiye danîn, û cuda ji hizb û rêkxirawên siyasî, ji aliyê çalakvanên biyavê edebî û ferhengî bi şewazên cur bi cur wekî:

Danîna dewreyên perwerdeya ziman, nivîsandin û çapa pirtûk û kovaran bi zimanê Kurdî û ...hwd ve, piroseya dagîrkariya Kurdistanê digel têkşikan û dorandinê berbirû dikan.

Hunermendekî Kurd bi du sal hepsê hat cezadan

Taya yek a dadgeha Şoreş ya bajarê Urmîyê, 2 sal cezaya hepsê bo hunermendê Kurd birî.

Li gorî nûçeya ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya “Kurpa”yê, roja Duşemî 13`ê Reşemehê (4`ê Adar)`ê hunermendê Kurd yê bi navê “Pêyman Mîrzazade”, bi du sal hepsa te`izîrî hat cezadan.

Li gorî gotina kesên nêzîkî wî hunermendê Kurd, roja Şemî 11`ê Reşemeh(2`ê Adar)`ê “Pêyman Mîrzazade” li taya yek a dadgeha Şoreşê ya bajarê Urmîyê, ji aliyê dadwer “Çabok”, bi tohmeta “encamdana çalakîyên teblîxî li dijî nizamê” bi du sal hepsa te`izîrî hatiye cezakirin.

Li gorî vê çavkaniyê, dadwer “Çabok” li hemberî danîna barimteyê bo azadiya demkî a wî hunermendê Kurd bo heya hatine dema civîna dadgehê, dijberî kiriye.


Li gorî gotina vê çavkaniyê, ew hunermendê Kurd, heya niha jî di girtîgeha Navendî ya bajarê Urmîyê de ye.

Ew hunermendê Kurd, bi tawana endambûna li yek ji partiyên Kurd yên opozîsyona hikûmeta Îranê, hatiye desteserkirin.

Roja Duşemî 6`ê Reşemehê, ew hunermendê Kurd, piştî lêkolînê bo girtîgeha Navendî ya bajarê Urmîyê veguhestine.

Ew hunermendê Kurd li 28`ê Sermaweza 1396`an bi tawana “gotina stranên şoreşgerî yên Kurdî” ji aliyê hêzên îtîla`atê ve hatibû desteserkirin, û di heftiya duyem ya Befranbara wê salê de jî, ji aliyê taya 3`ê ya dadgeha Şoreş ya bajarê Urmîyê bi tawana encamdana “çalakîyên teblîxî li dijî nizamê” bi bê hebûna parêzer, bi 6 meh hepsê hatye cezakirin.

Pêyman Mîrzazade” roja Înê 18`ê Cozerdana sala borî, piştî derbazkirina 6 mehan di girtîgeha bajarê Urmîyê de, hatibû azadkirin.



Berpirsên xwendingehan soz û qewlan ji desrxwanan werdigrin

Berpirsên xwendingehan, Soz û qewlan ji desrxwanan distînin da ku, di rêûresma Çarşema dawîya salê de, beşdariyê nekin.

Berpirsên xwendingeha “Mubîn a 1” ya li bajarê Selasa Bawecanî, Soz û qewl ji desrxwanan standine da ku, li rêûresma Çarşemî (Çarşemî sorî) ya dawîya salê de, beşdarî nekin.

Ew biryara ji aliyê berpirsên xwendingeha Mubîn a 1 wiha

hatiye ragehandin ku, zarok di vê rêûresmê de, rastî şevat yan jî birîndarbûna dest û pê û herwisa birîndarbûna tewaw a cendek dibin.

Li gorî çavkaniyek agehdar di vê derheqê de, ku ji Ajansa Nûçegihaniya “Kurpa”yê re daye zanîn, biryarên wiha yên berpirsên xwendingeha Mubîn a 1, di demekê de bûye ku, wan berpirsan tu deshilatek bo derkirin yan jî birêvebirina biryarên wiha nînin, belkû ev ji aliyê navendên ewlehiyî yên hikûmetê bûne, ku beşdarîkirina di rêûresmên bi wî rengî de, dibe çavkanî û hincetek bo karbidestên hikûmetê.

Herwisa vê çavkaniyê daye xuyakirin ku, berpirsên hikûmetê, li berpirs û mamostayên xwendingeha “Mubîna 1” ya bajarê Selasa Bawecanî re ragehandine, ku hekî wê biryarê çibicî nekin, wê mamostayên wê xwendingehê ceza bidin.



Ciwanekî Kurd li warê zanistî pileya sêyem bi dest xist



Ciwanê Kurd yê xelkê Rojhilata Kurdistanê, di rêkeberiyên zanistî û tekînkî de li asta Îranê, şîya pileya sêyem a zanistî, bi dest xwe bixîne.

Mihemedriza Kehrîzî xelkê bajarê Kamyarana girêdayî parêzgeha Sine, di rikeberiyên robotîk û hişê destçêkirî a navdewletî de şîya pileya sêyem a Îranê bi dest xwe bixe.

Rêkeberiya robotîk û hişê destçêkirî a navdewletî li Tehranê hate lidarxistin, û ev ciwanê Kurd xelata “Fîrakap a 2019`an”, ya derheq behsa kodakoptirî bi destve anî.

Ciwanên Kurd tevî arîşe û nebûna îmkanatên hewce yên dersxwindinê, di Îranê û cîhanê de, di warê zanistî de, bilindtirîn pileyan dest xwe dixin.

Ciwan Haco: Hêvîdar im Kurd bibin xwedî dewlet

Hunermendê navdar ê Kurd, Ciwan Haco, bi mebesta salvegera şehîdkirina rojnamevana Rûdawê Şîfa Gerdî, ji bo ku beşdarî merasîma Xelata Şîfa Gerdî ya Cîhanî bibe, hatibû Başûrê Kurdistanê.

Hunermend Ciwan Haco, ku di albûma xwe ya dawî ya bi navê 'Felek' de stranek bi ser navê Şîfa Gerdî çêkiribû, di merasîma Xelata Şîfa Gerdî ya Cîhanî de stran got.

Haco di pirotirameke Rudawê de wiha axivî: "Me gellek mirovên hêja wunda kir û yek ji wana jî xûşka me ya hêja Şîfa Gerdî bû. Heyf e ku em însanên wilo wunda dikan. Lê ez vena dibêjim. Evna wê her di dilê me de bimîn, di dilê me de her jiya bin. Namirin di dilê me da û hêvîdar im ku ew xwîna wan, canfîdayiya wan ji bo armançekê bû. Ji bo vê şehîd ketin.

"Hêvîdar im Kurd bibine xwedî dewlet"

Hunermendê navdar Haco, di berdewamiya axaftina xwe de behsa hêviya Kurdan a dewletbûnê kir û got: "Hêvîdar im ku rojekê mîletê Kurd bibine xwedî dewlet. Kurdistanek azad, rizgar. Hêvîdar im ev qonax were çibicîkirin."

Di derbarê albûma xwe ya dawî

de jî Ciwan Haco anî ziman ku ew hêvî dîke ku albûm, bi dilê kesên ku lê guhdarî dikan be û got: "Raste, gava ku meriv albûmeke nû çêdike, divê pêşî bi dilê ew kesê ku çêdike be. Bi dilê min bû lê hêvîdar im ku bi dilê mîletê min jî be."

"Rûdaw ne tenê rojnamevanî, alîkariyeke pîroz a hunerê jî dîke"

Hiwan Haco, qala xebatên tora medyayî ya Rûdawê yên di derbarê ragihandin û xizmeta li hunerê de jî axivî û ji ber ku alîkariya hunermendan dîke, spasiya Tora Medyayî ya Rûdawê kir.

Peyama Haco li ser Efrînê

Ciwan Haco hestên xwe derbarê Rojavayê Kurdistanê de anî ziman û got: "Rojavayê Kurdistanê dilê min e. Qamişlo dilê min e. Ez li wir mezin bûm, min zaroktiya xwe li wir qedand. Dilê min bi wana ra ye. Her çiqas car jê em rexneyan dikan



jî, ez weke Kurdekî dixwazim tifaqa Kurdan li wir çêbibe, ne zêdetir. Lê ez dixwazim ji Kobanê heta Dêrikê, ev erd di destê Kurdan de bimîne û wek Efrînê lê nebe. Ew erda Efrînê mixabin kete destê çetan, kete destê nexêrxwazan, kete destê terorîstan."

"Ez amade me li Rojava konsêrtêkê çêkim"

Li ser pirsar; "Ciwan çima naçe konsêrtêkê li Rojavayê Kurdistanê pêşkêş nake?" hunermendê navdarê Kurd, Ciwan Haco, diyar kir ku ew amade ye li her çar perçeyên Kurdistanê konsêrtan pêk bîne û da zanîn ku ger ew dikaribe biçe li Rojava konsêrt bide, ew dê biçe.

"Ji mayîna leşkerên Amerîkî kêfa min tê"

Ciwan Haco biryara mayîna leşkerên Amerîkî li Rojavayê Kurdistanê, weke agahiyeke pîroz bi nav kir û axaftina xwe wiha domand: "Xebereke gelekî pîroz min bihîst ku 400 leşkerên Amerîkî dê li Rojavayê Kurdistanê bimîn. Pîroz e, kêfa min gellekî tê weke her Kurdekî. Em dixwazin ew erda pîroz di destê Kurdan de bimîne, di destê YPGê de bimîne, destê PYDê de bimîne, lê em dixwazin ku ew partiyên siyasî yê dî, ew jî werin beşdar bin. Yanî Pêşmerge Rojava jî were karê xwe bike di wir da. Bi hevdû ra. Em bi hevdû ra mezin dibin, bi hevdû ra hêza me xurt dibe, em bi qewettir dibin. Ev in rexneyên min di vê meselê da." Rudaw

Amûra muzîkê wate «ÛD» dîroka wê vedigere berî hezar salan



Li Tirkîyê li bajarê Mîrsînê, Mustefa Madendag ku karê çêkirina amûra muzîkê ya ûdê dîke, dibêje ku dîroka ûdê berî hezar salan dest pê kiriye.

Mustefa Madendag dibêje: "Ya ku em dizanin her çend Ereba ûdê weke berhema xwe dibînin jî, ûd tembûreke Tirkî ye, ji kobizê hatiye peyda kirin. Ûd di destên Tirkên ku ji Xorasanê çûbûn Bexdayê de hatibû dîtin, Ereba gelek jê hez kirin, li ser xebitîn û weke amûreke xwe qebûl kirin."

Weke gelek amûrên darînî, divê ji bo ûdê jî darên bi kalîte, 70-80 salî ku baş hişk bûne werin bikaranîn. Ji bo çêkirina ûdekê divê 35-40 rojan li ser bixebitin.

Bihayê ûdekê nêzîkî 20 hezar lîreyên tirkî ye (derdora 3 hezar û 700 dolaran), li gor şarezayiya hosteyê ku çêkiriye, dara ku jê hatiye çêkirin, xweşiya dengê ku jê derdikeve, bihayên wan diguherin.

Mustefa Madendag diyar dîke ku ew bi xwe bo hemû bajarên Tirkîyê ûd şandine, herî zêde jî difiroşe welatên Almanya, Holanda û Swêd, ji welatên Ereba jî, ji Dubaî, Iraq, Erebestana Siûdî û Sûriye re dişîne.

Zimanê Kurdî

Li vir ev (ka) ne bi mebesta zanîna cihekî nenas yan rewşeke nepen bikar hatiye. Tenê ji boyî ku em hestê xwe, derbarî wê jiyana têkçûyî berçav bikin .

b- “Ka”, weku alaveke agadariyê (ne cînav) jî bikar tê. Ev alav wateya karekî fermanî yan daxwazî bi xwe ve digre . Wek : - Ka wê pênuşê ! (Wê pênuşê bide min) -Ka em biçin şanogehê ! (Dixwazim, em biçin şanogehê)

Alava “ka” bi (2) coran tê xebitandin :

1- Dikeve ser hevokên pirsdar, yên ku bi cînavên pirsiyarî saz dibin : - Ka te çi kir ? - Ka em kê xelat bikin ? yan jî bê cînavên pirsiyarî : - Ka dengê te nayê min ? - Ka te ji bavê xwe re got ?

2- Bi wateya alava agadariyê “de” : - Ka rabe, li me dereng e (De rabe, li me dereng e - Ka were, ez te bibînim (De were, ez te bibînim)

Têbînî :

1- Digel ku (ka) ya alav bi wateya karê fermanî jî tê, lê ew ne kar e. Çiku hel û mercên pênasîna karan, wek (bûyer, veguheztin û rawegorî) bi xwe ve nagre.

2- Li gora watedariya hevokan cor û têgeha “ka” yê destnîşan dibin û tene nasîn.

“Kengî” :

Cînavê “kengî” cînavêkî pirsiyarî ye, bi wateya (çi demê) tê xebitandin : - Tu kengî hatî ? - (Tu çi demê hatî ?) Ev cînav bo zelalkirina demê tenê bikar tê. Anku, bi şeweyekî pirsiyarî, cihê hevalkarên (hokerên) demî digre û dema bûyîna karan, di rêxistina hevokan de destnîşan dike . Wek : - Kengî sînema Amûdê şewitî ? (Sala-1960-ê sînema Amûdê şewitî) - Amûd kengî hat şewitandin ? (Amûd sala (1937)ê hat şewitandin) - Em ê kengî herin Laleşê ? (Em ê paşî Nûrozê herin Laleşê) Di van mînakên de, dema bûyîna bûyerên (şewata sînemayê, şewitandina Amûdê, çûna Laleşê) bi pirsî “kengî” zelal bûye. Çiku, bi bersiva “kengî” hevalkarên demî (sala 1960, sala 1937, paşî Nûrozê) destnîşan bûne.

Li gora dîtina min, cînavê “kengî” cînavêkî lêkdayî (hevedûdanî) ye, ji cînavê pirsiyarî (kî) û bêjeya (hingî,

hingê) pêk hatiye.

- Kî : Ev cînavê pirsiyarî, bi vê raweya xwerû (sade), bo hişmendî (mirov) tenê bikar tê : - Ji van xwendekaran kî serkeftî ye ? Lê bo giyanber û tiştan ne diruste ku em bêjin : - Ji van hespan kî bezatir e ? - Ji van pênuşan kî baştir e ?

Dema ku cînavê (kî) bi şeweyekî lêkdayî bikar bê, hingê bo giyanber û tiştan jî, tê xebitandin : - Ji van lawan kîjan (kî ji wan) jîrtir e ? - Ji van hespan kîjan bezatir e ? - Ji van pênuşan kîjan baştir e ?

- Hingî (hingê) : Ev bêje di firhengên zimanê kurdî de bi (hing, hingam, hengam, engam) hatiye. Lê herî wateya demê dide : - Hinga tu hatî ez ne li malê bûm (Dema tu hatî ez ne li malê bûm) - Wê hingê ez li mêşeyê bûm. (Wê demê ez li mêşeyê bûm)

- Hingî te fikir pit-pit, me xwe ji bîr kir.

(Berdewam te fikir pit-pit, me xwe ji bîr kir)

- Hingî pit-pita te bû, me xwe ji bîr kir.

(Her gav pit-pita te bû, me xwe ji bîr kir)

Vêca ku cînavê pirsiyarî (kî) û hevalkarê demî (hing, heng, eng...), bi hev re ev cînavê lêkdayî “kengî” saz kiribe, gerek em bizanin ku vî cînavê lêkdayî têgeha pirsiyariyê ji “kî”yê wergirtiye û têgeha demê jî, ji (hing)ê wergirtiye, wekî kû cînavê lêkdayî (kîjan) wateya xwe ji (kî + ji + wan-van) wergirtiye. Li gora vê ravekirinê cînavê “kengî” cînavêkî lêkdayî ye, bo pirsiyara demê tenê bikar tê . Ev cînav ne guhêrbare û nakeve ber bandora verêşê (tewangê) . Anku, di hemû dem û raweyên hevokan de wekî xwe dimîne. Wek : - kengî bavê te çû gund ? - Mêvanên me kengî hatine ?

- Em ê kengî herin şanogehê ?

Carinan jî, ev cînav bi forma (kengê) hatiye xebitandin. Melayê Cizîrî di destpêka dîwana xwe de gotiye : “Newaya mutrib û çengê

fixan avête xerçengê

were saqî, heta kengê

neşoyin dil ji vê zengê ?!”

Hindek caran cînavê “kengî” bi şeweyê “kînga” jî bikar tê : - Kînga tu ji Amedê hatî ?

Têbînî : Gelek caran cînavê (kengî), bêyî têgeha pirsiyariyê bikar tê . Hingê weku hevalkarekî demî tê dîtin . Wek : - Kengî em çûn, em te ji bîr nakin. - Kengî tu hatî, were mala me.

Dom heye...

Trump: Em dê beşek ji hêzên xwe li Sûriyê bihêlin



Serokê Amerîkayê, Donald Trump kongrêsa welatê xwe piştrast kir ku dê hejmarek leşkerên wî welatî li Sûriyê bimînin.

Serokê Amerîkayê, Donald Trump kongrêsa welatê xwe piştrast kir ku dê hejmarek leşkerên wî welatî li Sûriyê bimînin.

Hewlêr (Rûdaw) - Serokê Amerîkayê, Donald Trump ragihand, ji bo parastina destkevtên wan li Sûriyê, dê beşek ji hêzên Amerîkî li wî welatî bimînin.

Trump di nameyekê de ji Kongrêsa Amerîkayê re

ragihandiyê, baweriya wî 100% pê hatiye ku divê beşek ji hêzên Amerîkayê li Sûriyê bimînin, daku rê li ber derketina DAIŞê bigrin.

Trump di nameya xwe de dibêje: "Weke we, em jî dixwazin piştrast bibi ku tevaya destkevtên me li Sûriyê ji dest naçin, ku DAIŞ êdî ti demi venagere, ku Îran bihêz nabe, ku destkevtên me tên parastin û em vê piştrastiyê jî didin li ser baştirîn encaman li Cinêvê, ji bo berjewendiyên Amerîkayê."

Trump di nameya xwe y abo Kongrêse de dibêje: "Ez ji %100 li gel vê nerênê me. Hemû tê cîbicîkirin."

Ji aliyê xwe ve Serfermandarê Artêşa Amerîkayê, General Joseph Dunford da xuyakirin, piştî biryara Trump a ji bo hêlana beşek ji hêzên Amerîkayê li Sûriyê, ew bawer dikin ku dê hevalbendên wan di Hevpeymaniya Nvadeletî de jî bi sedan ji serbazên xwe li bakur û rojhilatê Sûriyê bihêlin.

Ev nameya Trump bo Kongrêsa Amerîkayê piştî wê yekê hat ku roja 22ê Sibate hejmarek ji endamên Kongrêse yên ji herdu partiyên Demokrat û Komarî, nameyek ji serokê welatê xwe re nivîsîn û di nameya xwe de destxweşî li biryara wî ya ji bo hêlana beşek ji leşkerên Amerîka li Sûriyê kirin.

Aşkerekirina wê yekê ku dê beşek ji hêzên leşkerî yên Amerîkayê dê li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê bimînin, piştî derbasbûna du zêdetirî 2 mehan bi ser biryara vekîşandina hêzên wî welatî ji Sûriyê tê.

Amerîka bo Îranê: Danîna Reîsî weke serokê Dezgeha Dadê şermezarî ye



Amerîkayê li Aherber egera destnîşankirina Îbrahîm Reîsî weke Serokê Dezgeha Dadê ya Îranê, dilgiraniya xwe nîşan da.

Cîgirê Wezîrê Derve yê Amerîkayê, Robert Palladino di "twitt"ekê de li ser diyarkirina Îbrahîm Reîsî weke serokê nû yê Dezgeha Dadê ya Îranê,

bi tundî rexne li wî welatî girt û ev biryar weke şermezarî bi nav kir.

Robert Palladino ragihand, şermezarî ye ku li Îranê kesek bûye Seorkê Dezgeha Dadê ku destê wî di bidarvekirina bi kom a hezaran girtiyên siyasî de hebûye.

Robert Palladino herwiha

daye xuyakirin, Îran bi dadgehên xwe yên nedadperwer û zindanên li derveyî rewşa mirovahiyê, henekên xwe bi pêvajoya yasayî dike.

Di vê peyama xwe ya "twitter"î de, Palladino wiha gotiye: "Îbrahîm Reîsî ku dest hebûye di komkujiya girtiyên siyasî de, hatiye destnîşankirin ji bo serokatîkirina desthilata dadê ya Îranê. Çi şermezarî ye, rejîm bi rêdana bi birêveçûna proseya darizandekê nedadmend û herwiha çêkirina rewşeke nemirovane, henekan bi proseya yasayî dike. Îranî hêjayî ji wê baştir in."

Îbrahîm Reîsî kesayeteke konsevatîv (muhafizekar) e û ji Ayetullah Elî Xaminêyî, Rêberê Komara Îslamiya Îranê nêzîk e. Reîsî yek ji endamên lijneya naskirî bi Lijneya Mirinê bûye. Vê lijneyê

di navbera salên 1987 - 1988 de sizayê bidarvekirinê bi ser zêdetir ji 5 hezar girtiyên siyasî yên Îranê de sepandiyê.

Roja yekşemî 3ê Adarê, Endamê Komîsyona Yasayî ya Parlamentoya Îranê, Yehya Kemalpur ragihandibû, bi biryara Elî Xaminêyî, Îbrahîm Reîsî

li cihê Sadiq Larîcanî, serokê niha yê Dezgeha Dadê ya Îranê, dest bi kar dibe.

Wî parlamenterî gotibû, roja îne 8ê Adarê, biryara destnîşankirina Reîsî weke Serokê Dezgeha Dadê ya Îranê bi fermî tê ragihandin.



Karîkatora Mihemed Cewad Zerfî